**Komisyona Xelata Cemal Nebez**

**Namê xelatê**

Adar 20, 2025

**Komisyona Xelata Jemal Nebez a Weqfa Jemal Nebez a li Berlînê** şanaz e ku Xelata Jemal Nebez a sala 2025an pêşkêşî **Xana Omerxalî** dike ji bo xebatên wê yên akademîk ên di warê xebatên kurdî, nexasim xebatên êzdiyatiyê de.

Omerxalî, wek akademisyeneke sereke di xebatên êzdiyatiyê de, zanîna di warê teolojî, nerîtên devkî û binyadên civakî yên civata êzdiyan gelekî pêş xistiye. Dokumantasyona wê ya sîstematîk a deqên pîroz ên êzdiyatiyê û analîzkirina baldar a nerîtên devkî û nivîskî standardeke nû danine ji bo lêkolîneriya êzdiyatiyê û xebata wê kiriye çavkaniyeke bêhempa ji bo lêkolînên siberojê.

Hevkariyên wê yî bo rêzimana kurdî û binyada zimanî zanîna di warê emilandina kurdiya kurmancî a di peywendên him olî him sekuler de kûrtir kiriye. Wek profesoreke Zanîngeha George-August a Göttingen û Zanîngeha Azad a Berlînê, roleke girîng lîstiye di fêrkirin û belavkirina ziman û çanda kurdî û pêşxistina çavkaniyên zimanzanî û perwerdeyê yên kurdiya kurmancî.

Dîlsoziya wê ya xurt a ji bo mikemeliya akademîk û biryardariya wê ya ji bo parastina nerîtên êzdiyatiyê dengê êzdiyan bilind kiriye û ronî daxistiye ser berxwedêriya wan a di nav zordestî û qirkirinê de. Xebatên wê bandorek wan kûr çêbûye li ser gotara akademîk û ji ber vê Lijneya Xelata Jemal Nebez şanaz e ku xelatê pêşkêşî Xana Omerxalî dike.

**Haci Akman**
Profesor
**Beşa Arkeolojî, Dîrok, Xebatên Çand û Olî**
**Zanîngeha Bergenê**
**Norwêc**
Li ser navê Komisyona Xelata Jemal Nebez a Weqfa Jemal Nebez a li Berlînê, Elmanya